Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (270) | HEZÎRAN / 01-06-2024

«Nirxê genim dihêle koçberî li deverên me zêde bibe»

Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê ENKS biryara Rêveberiya PYD ya destnîşankirina nirxê yek kîlo genim bi 31 sintan şermezar dike û radighîne, ev yek dê ziyanên mezin bigihîne cotkaran û ewlehiya xwarinê li herêmê dixe metirsiyê.

> **«PYD stemê li cotkaran dike»**

Hevserokatiya Desteya Çandinî û avdanê ya Rêveberiya PYD, 26ê Gulanê biryar da kîloya genim bi 31 sentan ji cotkarên deverê bê kirîn. Di demekê de ku Rêveberiya PYD sala borî nirxê kîloya genim 43 sent diyar kiribû.

Li ser vê biryarê ku hejmarek ji welatiyan li navçeyên cuda yên Kurdistana Sûriyê daketibûn kolanan û nerazîbûna xwe li ser vê nirxê kêm nîşan dabû, ENKS jî di daxuyaniyekê de ragihand, “ev nirxê nedadperwerane, stemkariyek ji aliyê rêveberiya PYDê ve hatiye ferzkirin ku berjewendiyên xelkê û şert û mercên wan ên trajîk û dijwar li ber çavan nagire, ew cotkaran neçar dike ku berhemên xwe bi bihayekî gelekî kêmtirî lêçûna hilberînê bifroşin. Herwiha ENKS radighîne: “Ev nirx di demekê de ye ku genim ketibû ber şert û mercên keşûhewayê yên dijwar ku bandoreke nerênî li berhemanînê kiriye, ev yek jî rewşa cotkar û gundiyan aloztir dike û ewlehiya xwarinê û barê jiyanê dixe ber metirsiyê.Amaje bi wê jî kir, “Ev biryar, cotkaran neçar dike ku zeviyên xwe berdin û koçber bibin, ji bo peydakirina derfetên baştir li cîhek din, ku ev yek jî metirsiyeke rastîn li ser pêşeroja çandiniyê li herêmê çêdike. Da zanîn jî: “Ev biryar bû sedema nerazîbûnan, ku li hin navçe û bajaran girav, xwepêşandan û rûniştin hatin lidarxistin û ev biryar hat şermezarkirin û welatiyan daxwaza lêvegerê di vê biryara neheq de kirin.”
Di daxuyaniyê de hat jî: “ENKS bang li dezgehên navdewletî yên pêwendîdar bi aramiyê li Sûriyê dike ku fişarê li rêveberiya PYDê bikin ku vê nirxê nerewa ji nû ve ber çavan re derbas bike û bihayekî dadperwerane ku li gorî lêçûnên berhemanînê be û garantiya qazanca cotkar û gundiyan bike, diyar bike.”

> **«Pêwîste fişar li vê rêveberiyê were kirin»**

Li ser vê mijara ku bûye rojeva Kurdistana Sûriyê Rojnameya Kurdistan nerîna hejmareke welatiyan wergirtiye. Cotkarek dibêje, ti cudahiya PYD û rejîmên dektator nîne, ew dixwaze xelk birçî bibin û tenê di nanê zikê xwe de fikir bikin, ev nirxê hatiye destnîşan kirin dihêle bêhtir xelk koçber bibe û ji deverên xwe derkevin. Welatiyek jî wiha dibêje, rêveberiya PYD ji xwe re bazirganiyê dike û ne xema wê ye xelk yan welatî, ev rêveberî wê genimê cotkaran bi 31 sintan bikire û dê ji xwe re bi giranî bifroşe, û ev yek nayê qebûlkirin û cihê şermezariyê ye, û pêwîste sînorek ji van kiryaran re were danîn, PYD bi hestên cotkaran li Kurdistana Sûriyê dilîze û stemeke mezin li xelkê me dike.

48 sal bi ser Şoreşa Gulanê re derbas dibin



Zêdetir bixwîne...

Destpêkirina Ezmûnên dawiya salê li Sûriyê *Rûpel—3*

Roja Zimanê Kurdî *Rûpel—4*

«Şoreşa Gulanê peyamek zelal da hemû neyarên gelê Kurdistanê

Kurdistan

Hîna Sedam Husên û Mihemed Riza Şahê Îranê bi serkeftina rêkeftina xwe şad nebûbûn, li "Dol Zewî" li sînorê Hacî Omeran, mefrezeyeke Pêşmerge şikestin bi rêkeftina wan anî û bi dengê tivingên kevin, 23 Pêşmerge rûbirûyî artêşa Iraqê bûn û Bexda û Tehran veciniqadin.

«Şoreşa Gulanê şoreşa destkeftan e»

Li zozanên Kurdistanê, dawiya meha Gulanê, xweza û keşûhewa xweş û geş bûbû. Ewa Bexda û Tehranê bîr lê nekiribûn, şoreş serî hilbide, lê Pêşmerge bi vegera bo çiyayan û destpêkirina şoreşê, mirina rêkeftina wan ragihand. Di tomara bizava rizgarîxwaza Kurd de 26ê Gulana her salekê, taybet e bi bîranîna serîhildana Şoreşa Gulanê ye. Şoreş di şert û merceke cuda bû, ku Kurd rastî şikestina derûnî, siyasî û serbazî bûbû. Zehmet bû di rewşeke wiha de, ku Şoreşa Îlonê piştî 15 salan di Adara sala 1975an bişike, careke din dest bi xebata çekdarî bibe. Lê nerîna serkirdeyên genc ên şoreşê, bi taybet Serok Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî, fermandarê meydanî di wê demê de karîn careke din xewna destpêkirina şoreşê bikin rastiyek. Bi navbênkariya Serokê Cezaîrê Hewarî Bomedyen di 6ê Adara 1975an rêkeftinek di navbera Cîgirê Serokê Iraqê yaw ê demê Sedam Husên û Şahê Îranê Mihemed Riza li perawîza kongreya welatên Opec li Cezaîrê rêkeftinek îmze kirin. Li gor rêkeftinê, Iraq razî bû kendav di navbera Iraq û Îranê de bê dabeşkirin û pirsgirêkên sînorî bi Îranê çareser bike, bi merca ku Îranê deriyê piştevaniyê di rûyê şoreşa Kurdan de bigire. Rêkeftina di navbera Iraq û Îranê de, bi piştevaniyeke Erebî û navdewletî destbikar bû û Kurd bi tenê li çiyayan man. Serkirdatiya Şoreşa Îlonê rêkeftina Cezaîrê bi plangîriyeke navdewletî li dijî neteweke bindest û şoreşa wê binavkir. Şoreşa Îlonê bi kirdarî hemû derî bi rûyê de hatin girtin û Îranê sînorê xwe daxist û rêgirî li gihîştina her cure hevkariyeke mirovî û lojistî girt. Hevdem jî Iraq hemû danûstandin red kir û tenê bijardeya xweradestkirina şoreşê xwast, di endamê de şoreşa Îlonê piştî 15 salan ji xebat û qurbanîdanê rastî şikestina serbazî hat, lê serkirdeyên xwe radestî Iraqê nekirin û li rêkeftina Cezaîrê mikur nehat. Bi hezaran welatî û Pêşmergeyên Îlonê wek penaber berê xwe dan Îranê û li kampên penaberande man û serkidatiyeke demkî bo birêvebirina karûbarên partî û şoreşê pêk anî. Li kampên penaberên şoreşê de li Rojhilatê Kurdistanê, Partiya Demokrat a Kurdistanê xwe birêk xist û dest bi dirustkirina pêwendiyan bi şane û rêxistinên pêştir ên li nava Iraqê re kir. Hevdem ji aliyekî din ve jî, çalakvanên siyasî dest bi avakirina grûp û rêxistinên siyasî kirin, ta valahiya ji piştî koçberbûna Pêşmerge û kadroyên şoreşê çê bûye dagirin. Herwiha di bin çavdêriya Rêberê Şoreşa Îlonê Mistefa Barzanî de, Serok Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî dest bi tevgerê kirin, ta meşxelê şoreşê vêxînin. Ji bo wê jî, piştî danîna bernameyekê û amadekariyên pêwîst, roja 26ê Gulana 1976an mefrezeyeke Pêşmerge ku ji 23 Pêşmerge bûn, li navçeya "Dol Zevî" rûbirûyî yekîneyeke artêşa Iraqê bûn. Her çend e, şer û pevçûnan yek demjimêrê dirêj kir, lê dawî bi serdema şikestinê anî û destpêkeke din ji şoreşa rizgarîxwaza Kurd re dirust kir û venemirî heta Kurd li Iraqê gihandin nêzîkî serxwebûnê. Destpêkirina şoreşa Kurd û vêketina Şoreşa Gulanê, bû destpêkek ji mirina yekcarî ya rêkeftina Cezaîrê.

«Divê destkeftên şoreşê werin parastin»

Serok Mesûd Barzanî di peyamekê de bi boneya 48 salvegera Şoreşa Gulanê ragihand, ew destkeftên bidest ketine berhema xwîna şehîdan, êş û xebat û keda gel, Pêşmerge û xebatkarên şoreşa Gulanê û hemû şoreşên gelê Kurdistanê ye. Peyama Serok Barzanî: Şoreşa Gulanê qonaxeke girîng a dîroka gelê me û ezmûneke giranbuha ya berxwedan û rabûna gelê Kurdistanê ye. Di rewşa piştî nisko û koçberiyê de û di bin zextên cuda yên neyaran de, Şoreşa Gulanê bi planeke hûr û baweriyeke bilind hate destpêkirin. Şoreşa Gulanê ku hilgirê nirx û armancên Şoreşa Mezin a Îlonê bû, peyamek zelal da hemû nehez û neyarên gelê Kurdistanê ku tevî hêz û zordariya dijminan û hebûna plangêriyên cuda jî, gelê Kurdistanê xwe nada dest û kurên wî têkoşîna xwe derbasî qada têkoşînê ya rastî ku xaka pîroz a Kurdistanê ye, bikin. Di 48emîn salvegera Şoreşa Gulanê de, silav li giyanê yekem şehîdê Şoreşa Gulanê Seyîd Ebdulah Hacî Omeranî û hemû şehîdên Kurd û Kurdistanê dişînin û wan têkoşer û qehremanan ti carî ji bîr nakin ku di xebata Pêşmergayetî û partîtî û xebata nêhênî ya nav bajar û li koçberiyê de, rola wan hebû û qurbanî dan û dirok ji gelê xwe dirust kirin. Ev destkeftên ku bi dest ketine, berhema xwîna şehîdan, êş û keda gel, Pêşmerge û xebatkarên Şoreşa Gulanê û hemû şoreşên gelê Kurdistanê ne.

Azad Haco Hemê

Bi mezinan re merev mezin dibe

Tiltemir

Di jiyan min de suhbet û civat û rûniştinên herî xweş û şêrîn ku merev bi kesên dane emir an mezinan re rûdinê li wan temaşe û guhdar dike, Çimkî merev pirr dilşad û kêfxweş dibe û merev pirr sûd û mifayê ji wan digre ew jî jiber bûrandina gelek sal di jiyanê de û jiber kar û xebata wanî dûr û dirêj û jiber serpêhatî û geriyan û dîtina pirr dever û xelkên derdor an dunya yê, Car caran merev ji suhbeta wan têr nabe nexasim dema behsa çîrok helwest ezmon efsan serpêhat û nukteyên xwenî kenok dikin merev diçe dunyak din, Jiber xweşbûna guhdarîya wan merev carna sawêr dibe bi wan galgala re merev hezdike ku di wan kêlîkên ew buyer biwan re rû didan merev bi wanre ba ew kêlî û bûyer bi şopan da û bijiyana, Ev ji alîkî ji alîkî din ve dema merev bi wan re rûdinê û li suhbetê wan guhdar dike gava behsa demên xwe dikin behsa şert û merc an doz û bûyer û pirsgirêkên jiyanê dikin û çawa derbas dibûn di çi qûnaxê de, Çawa çare ji wan re dihatin dîtin û astengî ji pêş xwe radikirin merev pirr sûd û hiş vekirî dibe bi wan, Merev ji wan fêrî pirr şert û merc û aliyên jiyanê dibe û civata xwe nas dike der dora xwe nas dike merev jiwan nas dike çi ji merev reye û çi liser mereye û her wiha liser xeyinî mejî, Merev ji wan sînor xwe û qedir û rûmeta xwe nas dike, Merev jiwan fêr dibe dema merev an kesek bikeve kêşakê an piroglemek pêre çê bibe çawa merev karibe çarê jêre bibîne an xwe jê qurtal ke bê ezyet û zirar, Wate mîna navnîşana vê gotarê ku dibêje (merev bi mezinan re mezin dibe) ji lewra dibê em ji mezinên xwe hez bikin û qedir û nirxê wan bigirin û bi ya wan bikin çimkî ew ti car riya xwar naşî me nakin tim riya rast û durist û xêrê di din ber merev, Ger ne mezinên merev bin merev tişkî jivê duniyê fêr nabe û fêm nake û ji hev dernaxe merev bê mezinên xwe ne hêjaye tişkî ger merev wek wan bike an bi ya wan bike ti car merev ne poşmane û ti car poşman nabe, Jiber pendeke erebî heye dibêje (yê mezinê wî tunebe tevgîra wî jî tune) û pendeke KURDÎ jî heye dibêje (Jite mezin tire bi rojkê, Bi çerxekê zaneye) ji lewra her kes li gor navê xweye biçûk biçûke, û navîn navîne, û mezin mezinê nav û gotin û piratîke ye, Îcar jime tevan tê xwestin ku em her gav û wexit serdana mezinên xwe bikin bi wan re rûnên li derdor wan bin bi wan re suhbetê bikin li gotin û şêretên wan guhdar bin jiber ev tişkî pirr qenc û başe jibo civata me ya KURDÎ wate civata me hevgirtî dimîne bihna bapîr û kalan jê qut nabe hem jî kiltûrê me dimîne wenda nabe hem kêş û teşqela kêm dibin û her nifşek rol û erkê xwe nas dike, Dibê ku her dem û kêlî em hest bi meznên xwe bikin wan û rola wan bilind birxînin û wan bi tac kin deyinin ser serê xwe jiber ev tişkî pîroze ne kêmanîye, Di dawî de ez dibêjim rûnişta bi mezinan re mîna runiştenek ku merev pirtûkekê an ji pirtûkekê bixwîne, yeqîn car caran rûniştina bi wan re xweştire ji rûniştina bi mobayilê re.

Destpêkirina Ezmûnên dawiya salê li Sûriyê

Hêvî Delî- Qamişlo

Perwerde û Xwendin mijareke bingehîn û giring e, di vê were parastin ji bo misogerkirina şagirtan û avakirina nivşekî azad û pêşerojeke geş.Tê zanîn ku di dawiya vê meha Gulanê de, ezmûnên dawiya sala 2024an li seranserî Sûriyê destpê kirina ji ber vê yekê şagirtên her du polên 9 û 12an amadekariyên xwe kirina û di 27ê meha 5 an de, ezmûnên xwe li navendin cuda de pêşkêşkirin. Li ser vê babetê de rewşa Xwendekaran û amadekariyên wan ji bo birêvebirina ezmûnên dawiya salê, û di vê derbarê de Xwendekareke pola 12an , ji rojnameya kurdistan re wiha got: Ku di dema niha de em ezmûnên xwe pêşkêş dikin û ji destpêka salê ve amadepaşiyên baş kirina û lêvegerên berdewam ji waneyên xwe re çêdikin, ji bilî hemû kêşeyên li rûbirûyê me derdiketin taybet di vê rewşa awarte de ku em têde derbas dibin li kurdistana Sûriyê, ji ber ku li herêmên Kurdî du rêbazên xwendinê têne dayîn, yek ji wan rêbaza xwendinê ya bi ser rêjîma Sûriyê ve ye û rêbaza xwendinê ya bi ser rêvebiriya xweser ve ye, û ev yek dihêle rewşa xwendinê li Rojavayê Kurdistanê tevlîhevtir bibe, û herwiha ji aliyekî din ve yek ji wan sedemên sereke têkçûna rewşa aborî û bilindbûna nirxê kursatên madeyên xwendinê, û nebûna ronahiya şevê derbarî birîna elektirîkê a berdewam, ev sedem bandorek neyênî li ser derûniya Xwendekaran bi giştî dike, Herwiha ji rexekî din ve berdewam kir gotina xwe ku mamosteyên me jî baş alîkariya me dikin çi bi rêya kursan be û çi li ser malperên çivakî be mîna girûpên WhatsAppê. Di roja 26ê Gulana 2024an, xwendekarên refê 12 an, bi hemû beşên xwe yên zanistî û wêjayî ta 13ê Pûşberê wê ezmûnên xwe birêvabibin. Û her li ser berdewamiya vê mijarê Mamosteyek ji rojnameya Kurdistan re ragihand: Em weku mamosteyan yek ji erkê me piştevaniya şagirtan bikin û alîkariyê ji we re pêşkêş bikin, û hizir û ramanên wan kûrtir bikin, di warê pêvajoya hînbûnê de taybet xwendekarên her du qonaxên amadeyî û navendî de ,di destpêkirina ezmûnên dawiya salê ve, ji bo bi aramî ezmûnên xwe pêşkêşbikin û bi awayekî serkeftî pêşxistinên zêde bi dest xwe ve bînin, û ji rexekî din ve amaje bi wê yekê kir ku gelek xwendekar hejarbûn û nikarîbûn kursên madeyên xwendinê vekin , ji ber vê de ku proseya xwendinê li cem wan têk neçe em weku mamoste pirojeya xwendinê ji dûr ve destpêkir di çarçoveya belavbûna waneyan bi rêya Internêtê ser torên

civakî û çêkirina girûpan ji bo alîkariya Xwendekaran û him sûdê ji wergirin û bê xwendin nemînin, û di dawiyê de hêviya gevên serkeftinê ji bo hemû xwendekaran re dixwazin. Û Herwiha pola 9 an jî , ji 27 ê Gulanê ta 12 ê Pûşberê ezmûn berdewam bin, û li gorî wezareta Perwerde ya Sûriyê ragihandiya ku Îsal 2024an, hejmara pêşkêşkarên pola 12 an li seranserî Sûriyê gihiştiya 558 hezar û 865 şagirtî û li 5027 navendî li seranserî parêzgehên Sûriyê hatine dabeşkirin. Di heman demê de jî toreya Internêtê di katijmêrên ezmûnan de were birîn li gorî biryara hatiye standin ji wezareta Perwerde ya Sûriyê, û rêkarên taybet ji pêşkêşkirina ezmûnan bi awayekî aramî hatine kirin. Û hêjaya gotinê ku ji bilî hemû astengiyên ku xwendekar têde derbas dibin û tevî rewşa zehmet li kurdistana Sûriyê, lê hêvî û omîdên wan ji pêşrojeke geş re nayê rawestandin. Tê zanîn ku hejmara pêşkêşkarên pola 9an, li herdu bajarên Hesekê û Qamişlo gihişta zêdetirî 15500 şagirtî û li 79 navendî hatin belavkirin.

Henan Cefer

Roja Zimanê Kurdî

Bi boneya roja zimanê kurdî hezkiriyên ziman û çanda kurdî bi cil û bergên rengereng derketin seyranê û li havîngehê li hev civiyan, mamoste Hêman bi dilsozî derket ser dik yê ku berî wê bi rojekê amade kiribûn, bejna xwe xûz kir bi nirxandan ji amadebûna zimanhezan re û got "ziman nasnama mileta ye" bi hêvî me hûn xwedî li zimanê xwe derkevin, panzdehê gulanê wek roja zimanê kudrî hatî destnîşankirin ji ber ku weşana yekem bû "Hawar" bûye destpêka bikaranîna tîpên latînî roja tevî bingehîn e di sala hezar û nehsed û sî û diduyan de li bajarê şamê ji aliyê Celadet Elî Bedirxan ve derket (ziman serketin yan binketina mileta ye, û pêşkevtin yan paşveçûn e)

*ziman kulîna agahî û ramana ye, zimanê raborî, dema niha û paşerjê ye, endamê bingehîn e û tomara nasname ye, gel ava û vejîn dike bi şêwe ya netewî lê nijadperest şerê zimanê me dikin û keletora me sextekirin dikin ku tune bikin, îro em dibîsin û dibînin çawa zarokên me bi zimanê û kultûra biyanî bandor dibin wek em dê û bav û liberketiyê çanda kurdî hayî vê yekê hebin, em li dîroka xwe vegerin ew beşek e ji şaristaniyê ye, em zêmanê xwe biparêzin ji bêjeyên biyanî, em bizav bikin rêzimanê xwe nas bikin....

*çawa her yek dixwezê rûmeta xwe biparêzê ziman jî rûmet e, lewra ziman çanda ye, raman e, tora mirovtiyê ye , rola rasteqîn a avabûna mirov ya giyanî tevî kultûr û bîrdanka jîndar e, parastina kelepûr û nasname ye bêguman ziman pêwîst û girîng e di serdema zanistiyê de ku jiyana netewî berdewam be "dê û bav xewa şevê nakin ta mendal aram û dilxweş be" û ziman jî wisa ye.

*hêjano bi hemû zimanan bixûnin û bi zimanê xwe binivîsin ji bo zimanê we dewlemend bibe, her tişt bi zimanê dayîkê xweş e ta nifir, çêr û sixêf jî. Hûn dikarin nifir û sixêfan û biwêjan bişînin ku em li ba xwe binivîsin ziman barana erd û ezman digehe hev û erdê şîn dike bi gul, gulîlk û geya dixemlîn e xemla milet jî ziman e...

*çepik bilind bûn û kevok ji rekehê felat kirin li ezmanê seyrangehê perwaz kirin û geriyan bi dilgeşî roja xwe domandin. Çend roj di ser vê boneyê re derbas dibin kurdekî dilsoz ku ji aliyê berhevkirina biwêj, nifir û sixêfan vex west alîkariya mamoste Hêman bike radibe bi telefûnê lê digerê Hêman çawa pêgera xwe vedikê di ci de dibêje mamote min ji te re çendek berhevkirin e û bi awayekî lezok dibêjê kurê kerê, teres bav, xweda te nehêle, bêrûmet, stû li te bişkê, qet tu têrnexê, xweda dikim felc bibe... mamoste Hêman hêrs û engirî bû got law tu kîyî tu şerm û fedî nakê yekser pêger li rû wî girt.



Qîrîn Ico

Rola avê di çîrokên Kurdî de

Bê guman rola avê gelek girînge li ser gerdonê, û ji bo berdewamiya jiyanê.
Av tê wateya jiyanê. Cihê ku av têde heye, avahî têde heye, ew cih gelek guherîn têde çêdibe, çi ji aliyê bajarî ve, yan civakî, hizrî, aborî, kesayetî.
Ji aliyekî din ve, gelek caran av bûye sedema şerê cihanî yê, Hîroqlîtis (1) di felsefeya xwe de dibêje: Jiyan her dem tê guherîn, mirov nikare du caran bikevê heman avê de ji ber ku guherîna jiyanê berdewam e, carna şer girîng e ji bo guherîn û pêşkeftina cihî, û hizirî, aboriya bajarên ku şer têde çêdibin, ew jî ji bo parastina jiyanê bi nerîna wî.
Lê nerîna Talîs (2) cudaye ji nerîna Hîroqlîtis, ew dibêje: Av gelek girînge di jiyanê de, av karê bi gelek şêweyan xwe biguhêre, wek mînak; av dibe dûman û dibe ba û dibe ava qeşa.
Ji aliyê derûnî ve, av bûye sedema afrandina hizrên nû, dema Froyîd(3) nexwaşiya Ez Ezî (El-Nercisiye) nas dike bi riya çîroka Narkîsos, ew jî çîrokek herî bi nav û denge, dibêjin rojekê, Narsîs diçe ber çemekî, dema li avê dimeyzîne û xwe dibîne, aşiqê xwe dibe.
Roj bi roj ji ber evîndariya xwe nesax dibe û dihele, li dawiyê li rex wî çemê dimire. Li şûna cihê wî Nêrgiz derdikeve.
Froyîd ji wê çîrokê nexwaşiya Nercisiye derdixîne, û wek nexweşiyek derûnî niha tê naskirin di saykolojiyê de.
Ji alîkî din ve, av di metelokên Kurdî de cihê xwe girtiye, gelekî bi kar anîne, wekî:
"Ji ava gişgiş netirsin, ji ava meyî bitirsin"
"Wek avê meyî ye di binre tê yekî"
"Roj wek avê ye"

Rola avê li ser çîrokên Kurdî
Av pir caran roleke sereke dilîze, di guherîna bûyerên çîrokan de, ew guherîn çêdibe ji aliyê kesayetî dema guherîn dikeve li ser qehremanê çîrokê. Carna av dibe sedema guherîna yasaya bajarekî, wekî niha ezê li ser sê çîrokên balkêş rawastim û çawa av dibe sedema guherîna bûyerê çîrokan

Çîroka yekem:
(Memê Alan) guherîna cihî
Di çîroka serpêhatiya Memê Alan, av dibe sedema yekem ji bo guherîna bûyerên cihî, dema Mem hespê bozê Rewan ji Deryayê derdixîne, ew hesp dibe hevalê Memê ji bo bighîne Zîna Zîdan, li bajarê Cizîra Botan, em bala xwe didin ku çawa di destpêka çîrokê de, bûyer di bajarê Mixribê de ye, piştre Mem ji bajarê xwe derdikeve ber bi bajarê Cizîra Botan diçe, li vê çîrokê de av rola wê girîng bû, dema Mem hespê ji avê derdixîne, paşî ew dibe havalê riya wî, eger ew hesp ji avê dernexstiba, belkî Mem ji Bajarê xwe dernediket, û lipey viyana xwe nediçû, û rastî mirina xwe nedihat, û gelekî bi nav û deng nedibû, û di bîranînên mirov de nedima.

Çîroka Duyem:
(Mîr û bajarê gencan) guherîna yasa.
Di çîroka duyemîn de av dibe sedema biryara guherîna yasayê. Dema mîr biryara kuştina kal û pîrên bajarê xwe derdixîne, ji bo bajarê xwe bi bajarê gencan bide naskirin, ji ber ku fayda kal û pîran nîne bi nerîna wî paşayî, lê tenê malbatek bavê xwe vedişêrin, heta di rojekê de gemiyek mezin di deriyayê de asê dibe ji ber ku Hûtek mezin di deryayê de nahêle kes biçe.
Heta rojek ew malbata ku bavê xwe veşartine, ji bavê xwe re dibêjin, û ew dihêle hût riya gemiyê veke. Dema bavê wê malbatê dibêje, heta hun ji vî hûtî rizgar bin dibe hun eynikek mezin deynin hember wî ew jî bitirse û bireve.
Piştî Paşe zanî xelasbûna bajar bi riya kalê bû, biryara xwe ya yasayî bi kuştina kal û pîran radike.

Çîroka sêyemîn:
(Fat sêwîkê) guherîna kesayetî.
Di vê çîrokê de av dibe sedem yekem di guherîna jiyana qehreman de ew jî Fata Sêwîk e.
Ji du aliyan ve, yek dema avê ji kaniyê vedixwe û çêlmar dikeve zikê wê de, dibe sedem ku mar roj bi roj di zêkê Fat sêwîk de mazin bibe, jinbava wê bihêle bavê wê bibe çolê nêzîkî çemekê, bihêle.
Ya duyem, dema kalek li nêzîkê wê avê rastî Fat sêwî tê û çîroka wê dizane û marê di zikê wê de derdixe. Dema ji Fat sêwîkê re dibêje: Devê xwe ber çemê avê bibe, û marê di avê de gazî marê zikê wê dike. Piştire marê zikî wê derdikeve, Fat sêwîk di nava zîv û zêran de tê xemilandin, piştire jyana wê tê guherîn.

Di dawiya her sê çîrokan de, em bala xwe didin çawa av dibe sedema guherîna jiyana Memê Alan dema Hespê Rewan ji avê derdixîne, û ji welatê xwe derdikeve ber bi bajarê Zînê ve diçe û li wir jiyana xwe jidest dide û çawa di çîroka duyem de, yasaya bajarekî tê guherîn, ku gund ji hût rizgar dibe. Di çîroka Fat sêwîkê de em dibînin jiyana wê tê guherîn, dibe xatûna bajar, ji Mîr de dizewce
Li dawî jî em li dunyayê dimeyzînin çawa av sal ji salê kêmtir dibe, gelek şer li ser Avê çêbûne, bi taybetî şerên van salên dawî

Têbînî:
*Her du çîrok min ji devê bavê xwe wergirtiye.
*Çîroka Memê Alan ji dengê Cemîl Horo min wergirtiye.
- Hîroqlîtis: Feylesofekî Igrîqî ye.
-Talîs: Feylesofekî Igrîqî ye.
-Froyîd: Feylesofekî Elmanî ye.